Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1058 | 19-Nisan- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Lİ ŞENGALÊ CEJNA ÇARŞEMA SERÊ NÎSANÊ TÊ PÎROZKİRİN

**Li Şengalê Cejna Çarşema Serê Nîsanê tê pîrozkirin, malbatan serdana gorên şehîdan kirin û gotin; "Bi saya şehîdan em îro cejnên xwe bi xweşî pîroz dikin. Divê her kes xwedî li keda şehîdan derbikeve.**



Çarşema Serê Nîsanê bi boneya wê baweriya dibêje, wê rojê dinya hatiye afirandin û wê rojê her sal dîsa Xwedayê aleman Dîwana heft melekên xwe dicivîne ji bo ku qedera dinyayê û ruhberan ji bo sala li pêşiyê diyar bike, di nava Êzîdiyan de yek ji rojên herî pîroz ên cejnan e.

Di vê cejnê de civaka Êzîdî hêkan dikelîne û wan rengorengo dike. Ew hêk jî temsîla ji nû ve avakirina gerdûnê ne. Lewma di qewlên Êzîdiyan ên derbarê afirandina dinyayê de, teşbîha dureke mîna hêkê tê kirin ku bi şikestina wê deriya û dinya, pê re jî tevahiya gerdûn û jiyanê peyde dibe.

**Hesabê Laleşê**

Hefteyekê piştî hesaba Mergehê li her dera Êzidî lê hebin vê cejnê pîroz dikin ku jêre tê gotin hesabê Laleşê.

Di çarçoveya pîrozkirina cejnê de duh xelkê Şengalê serdana goristana Şehîd Dilgeş û Berxwedan kirin. Li ser gorên şehîdan mum hatin pêxistin û malbatan şehîdên xwe bi bîr anîn.

Yek ji malbatên şehîdan Xidir Hemed cejnê li hemû malbatên şehîdan û civaka Êzidî pîrozkir û got; "Bi saya van şehîdên ji her çar parçeyên Kurdistanê canê xwe dane, em îro vegeriyan ser axa we û rojên xwe yên pîroz pêşwazî dikîn.

Jina bi navê Caklîn Şengalî jî dibêje; "Ji bo ku em bikaribin li ser axa xwe jiyan bikin, ji her derê keç û xort hatin û canê xwe fedakirin. Her kes dizane eger ne bi keda van şehîdan ba, meyê nekarîba van rojan bi dilxweşî pîroz bikin. Divê hemû Êzidî li keda şehîdan xwedî derkevin û vegerin ser axa xwe."



Sudoku: Bersiv 67

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 7 | 5 | 3 | 8 | 1 | 2 | 4 | 6 |
| 4 | 2 | 8 | 6 | 9 | 5 | 1 | 3 | 7 |
| 6 | 1 | 3 | 4 | 7 | 2 | 9 | 5 | 8 |
| 2 | 5 | 4 | 7 | 6 | 8 | 3 | 1 | 9 |
| 7 | 3 | 6 | 5 | 1 | 9 | 8 | 2 | 4 |
| 8 | 9 | 1 | 2 | 4 | 3 | 6 | 7 | 5 |
| 3 | 6 | 9 | 1 | 5 | 4 | 7 | 8 | 2 |
| 1 | 4 | 7 | 8 | 2 | 6 | 5 | 9 | 3 |
| 5 | 8 | 2 | 9 | 3 | 7 | 4 | 6 | 1 |

Sudoku:Pirs 68

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 4 | 6 | | 8 | | 2 |
| | | | | | | | 6 | 3 |
| | 1 | 7 | | 3 | | | | |
| 1 | | | | 2 | 9 | | 8 | |
| 3 | | 9 | | 1 | | 4 | | 5 |
| | 6 | | 3 | 4 | | | | 1 |
| | | | | 8 | | 6 | 2 | |
| 2 | 8 | | | | | | | |
| 5 | | 3 | | 7 | 2 | | | |




## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Bac | **Diravên ku dewlet di berdêla mal û milk de ji welatiyên xwe distîne: Baca xaniyan pir biha ye.** |
| Cirm | Standina bi darê zorê ya mal, milk yan jî diravan ji mirovan: Rêbiran em cirm kirin. |
| Firîşte | Melek. |
| Koordîne (Fransî) | Ji bo xwegihandina armancekê pêkanîna girêdan, têkilî, rêxistin û ahengê di navbera çend karan de: X. karê kargehê koordîne dike. Koordînasyon. |
| Koordînator | Kesê karê koordîneyê pêk tîne. |
| Perû | Xelat, diyarî: A. saetek da B. got; ev perûya te ye. |
| Salewext | 12 meh: X. salewext cotkariyê dike. |
| Seranser | Ji serekî heta serê din. Tev, hemû: Ez li seranserê bajêr geriyam. |
| Seresere | Xemsarî. Girîngnedîtin: X. karê xwe seresere dike. |
| Rojev | Tiştên dibin mijara rojê: Di rojeva me ya îro de êrişên dagîrkeran hene. |



"HİLBİJARTİNÊN 14'Ê GULANÊ FERSENDEKE MEZİNE Jİ BO VEKİRİNA QONAX Û RÛPELEKE NÛ Dİ DÎROKA SİYASÎ DE.".R-4



RÊVEBERİYA XWESER Jİ BO ÇARESERİYA ALOZİYA SÛRİYEYÊ ÎNSİYATÎFEK RAGİHAND.R-3

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1058 | 19-Nisan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# ROJNAMEGERIYA KURDÎ ŞOPDARA RASTIYÊ YE

Rojnemevanên kurd diyar kirin ku ji destpêka damezrandina yekem rojnameya Kurdî û heta niha, zehmetî û astengiyên li pêşiya rojnamegeriya Kurdî bi dawî nebûn e û gotin: "Li beramberî tevahiya zehmetiyan jî, rojnamegeriya kurdî gelek destkeftiyên mezin bidest xist û meşa li ser şopa rastiyê domand." R-5

SERXWEBÛN | Ronahî | ANHA | كردستان | STÊRK | Ç TV | xwebûn | ANF NEWS | MA | ROJ NEWS | ARYEN TV

`JIN JIYAN AZADÎ` Sîstema Desthilatdaran Hejand

Amîne Bîrim diyar kir ku armanca hedefgirtina jinan, têkbirina îradeya civakê ye û got, dirûşmeya JIN JIYAN AZADÎ wê bibe bingeha azadiya jinan li tevayiya cîhanê.R-2




"ARMANCA DORPÊÇÊ TÊKBIRINA VÎNA GEL E"



Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Luqman Jaro diyar kir ku armanc ji dorpêça ku ji aliyê Hikûmeta Şamê ve li ser Şêxmeqsûd, Eşrefiyê û Şehba hatiye ferzkirin, têkbirina vîna gel û pirojeya Newteweya Demokratîk e.R-6


ÇÎROKNIVÎSA HUNERA DERBIRÎNA ÊŞA WELAT ROJÎN MÛSA

Jina kurd Rojîn Mûsa di warê çîroknvîsînê de gavên girîng avêtine pêş û bi pênûsa xwe çîroka bajarê xwe,mişxetiya kurdan û êşa welatê xwe dinvîsîne.R-7




"AZADIYA RÊBER APO AZADIYA GELAN E"

Malbatên şehîdan yên bajarê Qamişlo diyar kirin ku armanca tecrîda giran ya li ser Rêber Apo çewisandina vîna civak û tevahiya gelên azadîxwaze û gotin, Azadiya Rêber Apo azadiya tevahî gel û civakê ye.R-6



NIHA DEM HATIYE KU LI DIJÎ TİRKIYÊ ÇALAKTIR BIN
Zekî Bedran R-5

# `JIN JIYAN AZADÎ` Sîstema Desthilatdaran Hejand

Amîne Bîrim diyar kir ku armanca hedefgirtina jinan, têkbirina îradeya civakê ye û got, dirûşmeya JIN JIYAN AZADÎ wê bibe bingeha azadiya jinan li tevayiya cîhanê.

**Biroc / Qamişlo**

Di 14'ê Îlonê de Jîna Emînî (22), piştî polîsên exlaqê yên Îranê bi hinceta laçika xwe bi awayekî rast nepêça ye, girtin û bi awayekî hovane îşkence lê kirin, di encamê de gihaşt asta şehadetê. Dema ev sûcê hovane pêk hat, xwepêşandanên girseyî yên şermezarkirinê li bajarên Rojhilatê Kurdistanê hatin lidarxistin û piştre li bajar û herêmên Îranê Jî belav bûn. Ev xwepêşandan bi pêşengiya jin dest pê kir. Wek her car hêzên Îranê bi hemû rêbazên çewisîner li hember van xwepêşandanan sekinîn û di encamê de, li gorî raporên çapemeniyê bi deha kesî şehîd bûn. Tevî binçavkirin, girtin û êrişa leşker û polîsan, gel kolanan bernade û her ku diçe xwepêşandan firehtir dibin.

Li ser pêşengiya jina kurd ji serhildanên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratêk (PYD) Amîna Bîrim ji me re axivî.

Amîna Bîrim diyar kir ku armanca rêjîma Îranê ji hedefgirtina jinê têkbirian îradeya civakê ye û wiha got: "Rêjîma Îranê bi bihaneyên cûda jinan dikuje û işkenceyan li wan dike. Armanca wê ya sereke têkbirina îradeya civakê ye. Hedefgirtina jin û kesên azadîxwaz, vedigere hişmendiya Rêjîma îranê ya dewletbûnê û tekez dike ku dewletîbûn di sîstema Îranê de gelekî Kure bûye. Li Îranê rewş gihiştibû astekê ku dema gel dixwest xwepêşandanan bike, pir hisab dikir. Ji ber ku rê û rêbazên Kuştin û işkencekirinê ji demên desthilatdareiya Sefewiyan heta niha bênavber dewam dike. Tu carî em Zeyneb Celaliyan jibîr nakin, çawa di zindanê de cavên wê kur bûn û ti raghandinê cîhanê ev sûcê li dij mirovî şînber nekir û ji bo raya giştî dernexist holê."

**`Bi hiceta olperestiyê nirxên mirovaiyê têk dibin`**

Amîna da xuyakirin ku hişmendiya dewletbûyîn di sîstema Îranê de kur bûye û wiha dirêjî da axaftinê xwe: "Bingeha hişmendiya dewletîbûn li ser koletiya jin û serdestiya zilam ava bûye. Mînaka herî ber bi çav ji serdestiya zilam re, rêjîma Îranê ye û tevayiya rêjîmên Rojhilata navîne. Rêjîma Îranê bi hiceta olperestiyê, nirxên mirovan dike armanc, dixwaze jin, civak û gelên Îranê li gorî modêl û hişmendiya xwe birêve bibe û zagonên li gor berjewndiyên desthilatdariyê li ser her kesî ferz dike. "

**JIN JIYAN AZADÎ` bû dirûşmeyeke cîhanê`**

Amîne da zanîn ku Jîna Emînî, yek ji qurbanên hişmendiya desthilatdaran û wiha got: "Jîna Emînî bû çirûska serhildanên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê. Ew bû qurbaniya hişmendiya desthilatdar ya mêrê serdedest û bû çirûska berdewamiya şoreşa jin ya bakur û rojhiêatê Sûriyê. Dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` bû dirûşmeyeke cîhanê, JI Rojava dest pê kir û li cîhanê deng veda. Em dizanin ku berdêlên şoreş û sehildanan pir giranin, Îro bi sedan mirov di serhildanên Îranê de jiyana xwe ji dest dane û bi sedan hatine îşkencekirin û binçîavkirin. Serhildanên Îranê sekneke li hemberî hişmendiya dewletê ye. Bêyî hilweşîna sîstema dewletîbûn, civak nikare azad bijî. Sîstema dewlet û demokrasî ne pêkane bi hev re bê meşandin. Tenê jin dikare pêşengiya têkoşîna têkbirina sîstema dewlet ya ku mêrsalar serdeste, bike û azadiya jin û civakê misoger bike."

**`Fikrê Rêber Apo xelasiya mirovayiyê ji koletî û bindestiyê ye`**

Amîne balkişand ser fikrê Rêber Apo yê bingeha zadiya jinê, û wiha got: "Tevî ku li cîhanê bi dehan rêxistin û tevgerên jinan hene, lê azadiya jinê baş nehatiya fehimkirin. Hêzên desthilatdar li gorî berjewendiyên xwe hin zagonên bi navê parastina jin bicihkiriye. Bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê û belvkirina felsefeya Rêber Apo re, Azadiya jin û civakê pêş ket û li cîhanê belav bû. Fikrê Rêber Apo xelasiya mirovayiyê ji koletî û bindestiyê ye, herwiha ji bo jinan riya azadiyê ye. bi felsefeya Rêber Apo Jin dikare zincîrên koletiyê biqetîne, kefenê mirinê biçrîne û bi azadî bijî. Netenê ji bo jin, fikr û felsefeya Rêber Apo xelasiya gelên azadîxwaz e."





Endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratêk (PYD) Amîna Bîrim diyar kir ku dirûşmeya JIN JIYAN AZADÎ wê bibe bingeha azadiya jin li tevayiya cîhanê û axaftina xwe wiha qedand: "Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bi saya fikrê Rêbertî ji tevayiya cîanê re bû mînaka jiyana hevbeş ya gelan. Dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` ji destpêka şoreşa Rojava ve hat bilindkirin û wê dewam bike. Ji jinê Rojhilatê Kurdistan û Îranê tê xwestin ku xwe birêxistin bikin û têkoşîna azadiyê dewam bikin."

# 68 GİRTİYÊN JİN Jİ CPT'YE RE NAME ŞANDİN

**68 girtiyên jin, têkildarî mirinên li girtîgehên Tirkiyeyê nameyek ji CPT'yê re şandin û gotin: "Di zûtirîn dem de mudaxeleyî kiryaran li girtîgehan bikin, mirina li girtîgehan pêk tê rawestînin û rewşa hucreyên ku bi awayekî sîstematîk vedigerin cihên îşkenceyê bi raya giştî re parve bikin. Ji bo rawestandina van polîtîkayan hêza xwe bikar bînin."**

Hat diyarkirin ku Abdullah Oran ê 63 salî ku 2 sal in li Girtîgeha Sîncanê ya Enqereyê girtî ye di encama krîza dil de jiyana xwe ji dest daye. 63 girtiyên jin ên li Girtîgeha Jinan a Sîncana Enqereyê diyar kirin ku di sala dawîn a piştî mirina Abdullah Abdullah de bi dehan girtî bi gotina "Nexweş in, întîhar kirine, nexweşên derûnî ne" li girtîgehên Tirkiyeyê hatine qetilkirin. Ev her ku diçe zêde dibe. Girtiyên jin derbarê mijarê de ji Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê (CPT) re name şand.

Di nameyê de qala mirina Abdulah Oran hat kirin û wiha hat gotin: "Piştî erdheja ku pêk hatî û ji ber atmosfera niha ya hilbijartinê li girtîgehan îşkenceya sîstematîk zêde bûye û lê nayê dîtin. Em wek 68 girtiyên jin ên siyasî yên li Girtîgeha Sincanê ji bo girtiyên ku niha di hicreyê de hatine girtin bi fikar in. Berpirsê mirinan dewlet bi xwe ye ji ber ku tu tedbîran nagire. Her wiha li girtîgehan hejmara mirinan jî her ku diçe zêde dibe. Ev tişt nîşaneya domandina 'polîtîkaya darvekirinê ye'. Heke bêdengî bidome, rewşa hevalên me yên di hicreyê de hatine ragirtin bixe xetereyê.

Em bang li CPT'yê dikin. Em daxwaz dikin ku li hemberî mirinan bikevin nava tevgerê û mudaxale bikin. Di zûtirîn dem de mudaxeleyî kiryaran li girtîgehan bikin û rewşa hucreyên ku bi awayekî sîstematîk vedigerin cihên îşkenceyê bi raya giştî re parve bikin. Ji bo rawestandina van polîtîkayan hêza xwe bikar bînin."






# ÇÎROKNIVÎSA HUNERA DERBIRÎNA ÊŞA WELAT ROJÎN MÛSA


Jina kurd Rojîn Mûsa di warê çîroknvîsînê de gavên girîng avêtine pêş û bi pênûsa xwe çîroka bajarê xwe,mişxetiya kurdan û êşa welatê xwe dinvîsîne.

**Hemze Sêvo/ Qamişlo**

Nivîsandina çîrokê yek ji qadên huner û wêjeyê ye, ku bûyerên rasteqînî û hem yên xeyalî jî bi riya çîroknivîs re, di pirtûkên taybet de, tên nivîsandin. Herwiha nivîskarê çîrokan mijarên taybet û giştî yên civaka ku tê de dijî, hildigrin nav çîrokên xwe û bi wan bûyerên çîroka xwe vedihûnin û li ser vê bigehê karê çîroknivîsînê dikin.

Hêjayî gotinê ye ku di nav pirî çîrokan de, gelek sûdemendiyê dide zarok û mezinan; weke geşedana perwerdeyî,çandî, zimanî, hişmendî û hwd… ji bilî vê jî carnan ji ber hin sedeman, nivîskarê çîrokê, êşa xwe û civaka xwe dixe qalibê çîroka xwe de û ne bi awayekî yekser vê yekê derdixe. Çîroknivîsên kurd jî cihê xwe di nav asîmanê wêje û nivîsîna çîrokan de baş girtine, ku çîroknivîs Rojîn Mûsa jî yek ji stêrkên asîmanê wêjeya kurdî ya Rojavayê Kurdistanê ye.

Rojîn Mihemed Mûsa, ji gundê Şora Rojhilat ya girêdayî SerêKaniyê ye û bi sedema dagirkirina Serêkaniyê koçberî bajarê Qamişlo. Ew jineke 26 salî ye, xwendekara Zanîngeha Rojava ye, beşê Wêjeya kurdî, sala 4`an, li fakulteya Wêje û Zanistên Civakî, dixwîne. Herwiha Li bajarê Dirbêsiyê û Zirgan Peymangeha kurdî qedandiye û hem jî, hemû astên kurdî bi dest xistiye . Hêjayî gotinê ye ku Rojîn yek jinên kurd e, wê jî xebata xwe tevlî xebatên nivîskarên kurd yên beriya xwe kiriye û di 2019an de dest bi nivîsandina çîrokan bi zimanê kurdî kiriye .




**'Pênûs hevala zaroktiyê ye'**

Di derbarê gavên pêş yên nivîsîna çîrokê de û çîroknivîsînê, Rojîn Mûsa wiha ji me re axivî: "Nivîsandina min ji çîrokê re, ji dema zaroktiya min de ye. Min wê demê li gor zanebûna xwe çîrokên kurt dinivîsandin. Herwiha ji ber ku çîroknivîsî ji bo min zimanê xeyal û derbirîna min e, min dest diavêt pênûsa xwe û êşên xwe û civaka xwe di çarçoveya çîrokê de dinivîsandin, lê ne bi rengekî dirêj bû, herwiha bi domana demê re û bi, ez di warê nivîsîna çîrokan de bi saya bavê xwe ku wî piştriya min dikir û ew mamosteyê jiyana min bû û wî destpêk çîrokê min dixwendin. Bi domana demêre û piştî bidesxistina 3 astên zimanê kurdî û xwendina li zanîngehê, ev tev bûn bingeheke wêjeyî û aşopiya min ya nivîsînadinê berfirehtir bû û min gavên mezin di warê nivîsîna çîrokê xwe de avêtin pêş, lê xwendina zanîngehê yên ku derfeta nivîsînê tê de kêm bû, ez hinekî dûrî çîroknvîsê ketim. "

**'Êşa Serêkaniyê bû mijara destpêkê ji berhmên min re'**

Nivîskar Rojîn Mûsa di derbarê sedema nivîsîna çîrokan û siruşa çîroknivîsînê de wiha got: "Piştî dagirkirina bajarê bav û kalan;bajarê SerêKaniyê ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê û koçberiya min ber bi Qamişlo ve, êdî ji dûrketina min ji bajarî min, ez jî mîna hemû hemşerî û kurdan ku ji bajarê xwe dûrbikevin, min



êşeke mezin kêşand. Herwiha bi vî awayî min xwest ku çîroka bajarê xwe, civaka xwe bikim pirtûk û bi serenavê çîroka Xewna Meha Dihan di sala 2020`an li bajarê Qamişlo, çap bikim. Di dema niha de 3 berhemên min hene yek jê ya bi serenavê Xewna Meha Dihan, ya 2`an Çîrokên Zarokan û ya 3`yan jî Gotarên Siyasî, Civakî û Dîrokî ye. Mijarên piraniya çîrok û gotarên min rastînî ne û li ser rewşa kurdan, êş û azarên ku tê re derbas dibin, herwiha li ser polîtîkayê ne, ez niha sala dawî ji zanîngeha Rojava dixwînim û dûrî karê nivîsê ketime,herwiha piştî derçûna ji zanîngehê, bi hêviyeke mezin û bi piştgiriya bavê xwe ez ê pênûsa xwe dîsa bikim kar û xebatê û berhemên bi nirx binivîsînim. "

# TEV-ÇAND Ewropa, Hozan Sefkan bi bîr anî

**Navenda nûçeyan**

**TEV-ÇAND Ewropa bi daxuyaniyek nivîskî Hozan Sefkan bi bîr anî û got: "Tenê bi motîvasyon û baweriya Şehîd Sefkan, mirov dikare bibe endamê tevgereke xwedî rol û mîsyona di têkoşîna azadiyê de."**

TEV-ÇAND Ewropa bi boneya salvegera 38'emîn a şehadeta hunermendê pêşeng Sefkan (Celal Ercan) daxuyaniyek da. TEV-ÇAND Ewropa anî ziman ku tenê bi motîvasyon û baweriya Şehîd Sefkan, mirov dikare bibe endamê tevgereke xwedî rol û mîsyona di têkoşîna azadiyê de.

Daxuyaniya TEV-ÇAND Ewropa wiha ye:



"Di 38'emîn salvegera şehadeta hunermendê pêşeng Sefkan (Celal Ercan) de em wî bi rêzdarî bi bîr tînin. Têkoşîna azadiya Kurdistanê, rizgariya çand û hunera Kurd ku ji hêla dagirkeran ve hatibû talankirin, kiribû armanca xwe ya sereke. Ji roja destpêkê ve, têkoşîneke bê hempa di vê rêyê de meşand û heya vê rojê ew têkoşîna wî dewam dike.

Pêşengê vê tekoşîna bi nirx, hunermendê şoreşger û mîlîtanê azadiya Kurdistanê hevrê Sefkan (Celal Ercan) bû. Çand û hunera talankirî, bişaftina bê sînor û belavbûna hêza hunermendan atmosferekî neyinî afirandibû. Destpêkê 'Koma Berxwedan' ya ku bû dengê Şoreşa Azadiyê, piştre jî saziya 'Hunerkom' ku hemû beşên hunerê di bin baskê xwe de civand, rêxistin kir û pêş xist. Li gel hevalên xwe yên mîna Şehîd Mizgîn û Şehîd Çiya, bingehê sazîbûna tevgera çand û hunerê danîn. Şehîd Sefkan weke ku Rêber Apo dibêje, 'Hunermend şervanê gel e, şervan hunermendê gel e' bû. Ew li ser dikê şervan bû, li çiyayan jî hunermend bû. Ji bo ku em bikaribin Çand û hunera xwe biparêzin, rol û mîsyona hunerê di têkoşîna azadiyê de bizanibin, pêwîstiya me bi rêbaza Şehîd Sefkan heye.

Tenê bi motîvasyon û baweriya Şehîd Sefkan, mirov dikare bibe endamê tevgereke xwedî rol û mîsyona di têkoşîna azadiyê de.Careke din em rêberê eniya xwe ya çand û hunerê û hemû şehîdên têkoşîna azadiyê bi bîr tînin."

# SERXWEBÛN NE ASTENGDAR E, PARÇEYEK JI CIVAKÊ YE

**Nehîr Pale**

**Li civakê kesên ku pirsgirêkên wan ên tendurûstî hebin, nîv mirov li wan tê nêrandin û anceq xêran li wan bikin. Serxwebûn Ehmed Şêxo bi keda xwe radestî vê yekê nabe û berpirsyartiya xwe radike.**

Serxwebûn sala 1985`an li gundê Kor Elî yê rojavayê Kobanê tê dinê, zarokê mezin ê dayîk û bavê xwe ye, bi dayîkbûnê re felc dibe û piştî çend mehan dayîka wî ferq dike ew nexwezayî ye. Malbat hewl dide wî derman bike, lê çare bi destê wan nakeve û ew di dest, ling û zimanê xwe de felc dibe.

Êdî Şêxo li gorî rewşa xwe bi şert û mercan re dibe yek, malbata wî ji bo kar diçin Reqayê û ji wir jî derbasî Minbicê dibin, sala 2010`an piştî Minbic dikeve destê çeteyên DAIŞ`ê ew vedigerin Kobanê. Sala 2014`an jî piştî êrîşa çeteyên DAIŞ`ê li ser Kobanê û şer dijwar dibe ew derbasî bajarê Ruha yê Bakurê Kurdistanê dibe.

**Berpirsyartiya xwe radike û tevlî çalakiyan dibe**

Li Kobanê Serxwebûn hebûna xwe diyar dike, coşa ruhê wî venamirê, ji bo berpirsyartiya xwe rabike, niha cihekî kirîn û firotina telefûnan ji bona xwe vekiriye, bixwe dadikeve



bazarê û xwe birêxistin dike. Ne ji ber pêdiviyan dixebite lê dixwaze berpirsyartiya xwe rabike û parçeyek ji civakê be.

Her wiha li Kobanê tevlî hemû çalakiyan dibe, ew her tim hewl dide nêzî civakê be û niha jî mîna her sal rojî digre. Ew rêhevalê şêniyên Kobanê ye û buye ziraviyeke herî qeşeng ji jiyana wan.

# “HİLBİJARTİNÊN 14’Ê GULANÊ FERSENDEKE MEZİNE JI BO VEKİRİNA QONAX Û RÛPELEKE NÛ Dİ DÎROKA SİYASÎ DE.”

## Girêdayî hilbijartinên 14’ê Gulanê û rêveçûna qempaniya hilbijartinan û çi ji hilbijartinên parlamenê û serokomariyê tê hêvîkirin, çigirê serokê giştî yê HDP’ê Teyib Temel ji rojnameya me re nirxandinên giring kirin.

Teyib Temel da zanîn ku hilbijartina 14’ê Gulanê di dîroka siyasî ya Tirkiyeyê û ya Bakurê Kurdistanê de hilbijartineke dîrokî ye. Encamên wê bi her awayî dê bandorê li ser geşedanên navxweyî û herêmê bike. Ev hilbijartin, ji hilbijartinên berê cudatir e û gelek faktorên cur bi cur hene ku bandorê bi her awayî li ser proseya hilbijartinê dikin. Ji pergala hilbijartinê bigire heta diyarkirina namzetan, ji hevsengên pêkhate û tifaqan bigre heta kampaniya hilbijartinê, me pêvajoyeke gelek giring li pey xwe hişt û em niha amadekariyên xwe yên 14’ê Gulanê didomînin. Wek partî em jî li ser esasên wê yên giring ên dîrokî xebat û amadekariyên xwe dimeşînin û kampaniya xwe ya bangeşeyê bi rê ve dibin. Ji her aliyên Kurdistanê bigre heta gelek der û deverên bajarên Tirkiyeyê em xebatên xwe yên kampaniyê dimeşînin. Li her derê em navendên xwe yên hilbijartinê, buroyên xwe vedikin. Heta niha bi sedan buroyên/navendên xwe yên hilbijartinê me vekirin e. Her wekî din heta niha me namzedên xwe dan nasîn û her namzetek li devera xwe dest bi xebatan dike. Mal bi mal, tax bi tax, gund bi gund, kolan bi kolan, bi gel re ne.

Di vê pêvajoyê de em dibînin ku gelê me bi hêvî û baweriyeke qedirgiran û hêja, li partiya xwe, li nirxên xwe, li xeta xwe ya siyasî û li îradeya xwe xwedî derdikeve. Seremoniyên vekirina van navendan dibin wek mîtîngan. Gelê me jî bi vê helwesta xwe giringiya dîrokî ya hilbijartinan baş nas kiriye. Herwiha gel jî amade ye.

### MİJARA HİLBİJARTİNA SEROKOMARİYÊ JÎ Jİ BO ME MİJAREKE GİRİNG E.

Teyib Temel ji bona hilbijartinên 14’ê Gulanê destnîşankir ku partiya wan li ser du aliyan disekine. Yek aliyê parlamenê, ya din jî aliyê wê yê hilbijartina serokkomariyê ye. Ev herdu alî jî ji bo me mijarên stratejîk in. Ji bo hebûna me ya siyasî û ji bo bandora me ya polîtîk em stratejiya xwe ava dikin. Di mijara parlamenê de em dixwazin di asta herî jor de rêjeyeke nûneriyê bi dest bixin da bandora xwe ya siyasî bi pêş bixin. Armanca me ew e ku em derdora li parlamenê 100 nûneran bi dest bixin. Ji bo wê jî em hem bi Tifaqa Cumhur re hem jî bi ya Tifaqa Milet re têdikoşin.

Herweha divê em aşkera bikin ku hin rastî û hevsengên siyaseta Tirkiyeyê hene. Pergala wê ya hilbijartinê hat guhertin û îro em jî divê li gorî wê tevbigerin. Ji bo wê jî di nav 2 opsiyonan de em beriya her tiştî dixwazin Serokomar Erdogan têk bibin. Ji bo ku Erdogan neyê bijartin jî em rê li ber Kemal Kiliçdaroglu vedikin. Em vê riyê vedikin ji bo ku bibe fersend bo destpêkirina qonaxeke nû li Tirkiyeyê. Em Kiliçdaroglu jî Erdogan jî baş nas dikin. Ji bo wê jî ev biryar û tercîha me li gorî hevsengên siyasî yên Tirkiyeyê derketine pêş.

### GİRİNGİYA HİLBİJARİNÊN 14’Ê GULANÊ

Teyib Temel di berdewamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku Tirkiyê di qonaxeke gelek dîrokî de diçe hilbijartinên 14’ê Gulanê. Hem geşedanên navxweyî yên Tirkiyeyê hem jî geşedanên herêmî û navneteweyî giringiya vê hilbijartinê zêdetir dike. Ji Ege û Behra Spî bigre heta Sûriye-Rojava û Iraq-Başûr, Ji Qefkasyayê bigre heta Lîbya û Ukraynayê, hikûmeta AKP-Erdogan li ser stratejiyeke dagirkeriyê, şer, pevçûn û berberiyan siyasetekê dimeşîne. Ji bo wê jî bûye sedema gelek aloziyan û aramiya herêmê têk biriye.

Her wekî din li Tirkiyeyê jî di warê civakî, siyasî, aborî, îdarî de têkçûn û ruxandineke mezin heye. Pergala birêvebirinê li Tirkiyeyê têk çûye. Sazî û dezgehên birêvebirina bi temamî li gorî berjewendiyên AKP-Erdogan û alîgirên wan hatine avakirin. 72 roj berê erdhejek çêbû û di wê erdhejê de me careke din dît ku pergala sazûmanî ya Tirkiyeyê têk çûye û loma gel neçar û şerpeze ye. Ji ber vê yekê jî hilbijartina 14’ê Gulanê fersendeke mezin e bo vekirina qonax û rûpeleke nû di dîroka siyasî de. Em giringiya dîrokî ya hilbijartinê baş dizanin, lê em baş dizanin ku pirsgirêkên siyasî, civakî, aborî yên Tirkiyê her wekî din, bingeheke wan a dîrokî jî heye. Ji bo çareserkirina wan pirsgirêkan jî em dikarin vê hilbijartinê bikin fersend û rê û dergeheke nû û din vekin. Têkçûna desthilatiya AKP-Erdogan dê bibe destpêkek bo vê qonaxê û em jî ji bo vê yekê xebat û amadekarî û stratejiya xwe ya hilbijartinê dimeşînin.

### PARTİYA ÇEPÊN KESK WÊ DAWİYA AKP’Ê BÎNE

Temel di derbarê serboriya Partiya Çepên Kesk de çend xal rêzkirin û got: Partiya Çepên Kesk di nava kevneşopiya me ya siyasî de parçeyekî xeta me ye, partiya me ye. Ji ber astengî, qedexe û gefên girtina HDP’ê û ji bo ku hemû derfetên blokajê yê Erdogan bên pûçkirin, em bi Partiya Çepên Kesk diçin hilbijartinê.

Partiya Çepên Kesk û Hevpeymana Ked û Azadiyê, li hemberî herdû tifaqên desthilatdar û nîvdesthilatdar rê û xeta 3yemîn dişopîne û ava dike. Ji bo wê jî hewl dide bibe deng û nûnerê hemû netew, pêkhate, gel, bawerî, jin, ciwan û hemû aliyên civakê. Partiya Çepên Kesk navnîşana hevpar a hemû pêkhateyan e, ku rastî qedexe, astengî û cudakariyan tên. Helbet di nav van pêkhateyan de Kurd jî hene ku bi salan e têkoşîna azadiyê didin û pêşengiyê dikin da li Tirkiyê jî rêyekê ji bo demokrasiyê vekin. Ji ber vê yekê bi salan e ev xeta siyasî rastî êrîşan tê. AKP-Erdogan bandora xeta me ya siyasî dizanin loma hemû hesabên xwe, hemû dek û dolaban li dijî me dikin. Ji salên 90an heta niha, ji HEPê bigre heta HDPê ev siyaset qet nehatiya guhertin û îro jî bi her awayî ev nêzikatî berdewam dike.

AKP îro bi her awayî riziya ye, lê hemû derfetên desthilatiyê bi kar tîne û bi netewperestiyê, bi dijminahiyê, bi derewan gel dixapîne. Ji bo wê bi derfetên dewletê bandorê li ser gel dike. Di vê hilbijartinê de em dixwazin ku hem rêjeya AKPê qels bikin li parlamenê, hem jî Erdogan têk bibin. Lê ji bo wê jî divê hemû aliyên cur be cur zêdetir bixebitin. Em dixwazin dawiya AKP’ê bînin û hemû xebatên me jî ji bo wê ne.

### PARTIYA ÇEPÊN KESK WÊ BI PÊŞENGIYA JIN Û CIWANAN BI SERBIKEVE

Girêdayî rêje û cihgiritna jin û ciwanan di nava partiya çepên kes de, Temel anî ziman ku partiya Çepên Kesk li ser hişmendiya yeksaniya pêkhateyên civakê ava bûye û hewl dide bibe nûner û dengê hemû pêkhateyan. Di nav van pêkhateyan de helbet jin û ciwan jî beşeke giring ên civakê ne. Di nav namzetên Partiya Çepên Kesk de jî rêjeya jinan %40 e. Dîsa di nav namzetan de gelek ciwan jî hene.

Mijara jin û ciwanan ji bo xeta me ya siyasî û feraseta me ya polîtîk mijareke bingehîn e. Em bi her awayî yeksaniya jinan di siyasetê de diparêzin û rê li ber nûnertiya ciwanan vedikin. Ji ber ku jin û ciwan hêz û dînamîzma herî karîger in ji bo têkoşîna me ya siyasî. Bi taybetî di warê jinan de şoreşeke mezin pêk tê û geşedanên mezin rû didin. Û helbet li gel hemû astengiyan em nûnertiya yeksan wek xeteke bingehîn dibînin û ji bo wê jî xebatên xwe didomînin.

### Dİ hilbijartinên 14’ê Gulanê de AKP’Ê BİMÎNE JÎ BİÇE JÎ



### DÊ ENCAMÊN GİRİNG DERKEVİN” MEYDANÊ.”

Temel ji bona encamên ku ji hilbijartinan derkevin holê got: Helbet pirsgirêk û têkçûna li Tirkiyê îro ji ber birêvebirina desthilatiya AKP’ê ye. Ji ber wê jî çûyîna AKP’ê dê proseyeke nû bi xwe re bîne û bibe fersend ji bo niyeta çareserkirina arîşeyan. Lê ku eger AKP’ê bimîne hemû pirsgirêkên Tirkiyeyê û herêmê dê aloztir bibin û riya çareseriyê zêdetir bê girtin. AKP’ê dê vê yekê weke pesendkirina polîtîkayên xwe binirxîne û pergaleke faşîstir ava bike. Bi her awayî dê encamên xerab ji bo Kurdan jî ji bo gel û pêkhateyên Tirkiyeyê jî bi xwe re bîne. Ji bilî Tirkiyê jî dê bandoreke nebaş li ser geşedanên Sûriyê-Rojava, Iraq-Başûr û temamî deverê bike. Ji bilî AKPê, herşeş partiyên muxalefetê jî ne xwedî bernameyeke wesa ne ku çareseriyeke mayînde ji bo gelên Tirkiyeyê û Kurdan ava bikin. Di gelek mijaran de partiyên di nav muxalefetê de ji desthilatiyê xerabtir in. Ji bo avakirina Tirkiyeke nû bernameyeke wan a bibe bersiv ji bo arîşeyên civakî, siyasî aborî nîne. Partiyên muxalefetê û desthilatiya muxalefetê jî nikare pirsgirêkan çareser bike, ji bo wê jî em dibêjin rê û xeta 3yemîn û hewl didin ku Partiya Çepên Kesk bi hêztir bikin. Di nav herdû aliyên desthilatiyê û nîvdesthilatî de em serkeftina Partiya Çepên Kesk wek serkeftineke stratejîk û dîrokî dibînin. Hem weke bername, hem jî weke plansazî û nexşeriya çareserkirina pirsgirêkên Tirkiyê Partiya Çepên Kesk û xet û riya 3yemîn tekane opsiyona çareseriyê ye. Eger Partiya Çepên Kesk bi rêjeyeke mezin nûnerên xwe bişîne parlamenê, dê hevsengeke nû ji bo siyaseta Tirkiyê derkeve meydanê. Ew hevseng wê hem bandorê li ser çareserkirina pirsgirêka Kurd û hem jî yên Tirkiyê û hemû deverê bike.



# ROJNAMEGERIYA KURDÎ ŞOPDARA RASTIYÊ YE

## Rojnemevanên kurd diyar kirin ku ji destpêka damezrandina yekem rojnameya Kurdî û heta niha, zehmetî û astengiyên li pêşiya rojnamegeriya Kurdî bi dawî nebûn e û gotin: “Li beramberî tevahiya zehmetiyan jî, rojnamegeriya kurdî gelek destkeftiyên mezin bidest xist û meşa li ser şopa rastiyê domand.”

**Navenda Nûçeyan**

Di 22’ê Nîsana 1898’an de, Rojnameya Kurdistan ji aliyê Miqdad Mithad Bedîrxan ve li paytexta Misirê Qahîrayê hat derxistin. Ji ber ev rojname ya yekemîn di dîroka çapemeniya Kurdî de bû, roja derketina wê weke Roja Rojnamegeriya Kurdî hat ragihandin. Rojnameya “Kurdistan” tevî hemû derfetên kêm û zextên wê demê, bi 31 hejmaran ji Rojnamegeriya Kurdî re bû bingeh.

Piştî Rojnameya Kurdistan, gelek Kovar û rojnameyên weke Jiyan, Hawar, Jîn, Ronahî, Gelawêj û gelekên din li ser rêka Kurdistan hatin weşandin.Ji gavên herî mezin di dîroka rojnamegriya Kurdî de jî, weşangeriya Med TV hebû.Med TV, sala 1995’an li Belçîkayê dest bi weşana Kurdî kir.

Sedema weşana wê li derveyî welat, mîna ya rojnameya Kurdistan, zext û zordariya dagirkerên Kurdistanê bû. Zext û binpêkirinên di wê demê de bi dawî nebûn û heya roja îroj li ser rojnamegerî û rojnamevanên Kurd dewam dikin. Ji wê demê heta niha, gelek gav di çapemeniya Kurdî de hatine avêtin, ku bi dehan ronjame,ajans, malper û televziyon bi zimanê Kurdî weşanê dikin. Di vê rêyê de jî, rêya şopandina rastî û derxistina wê de, gelek kesan canê xwe feda kir û bûn şehîdên ragihandina rastiyê. Derbarê salvegera Roja Rojnamegeriya Kurdî, Hevserokê Ragehandina Azad Dilyar Cizîrî ji me re axivî .



### ’Ji xebatên ragehandinê re zemîneke mezin hat avakirin’

Dilyar Cizîrî diyar derbarê rewşa rojnamegeriyê li Kurdistanê wioha got: “Li Bakurê Kurdistnê hikûmeta AKP/MHP’ê bi dehan saziyên ragihandinê yên bi kurdî






weşan dikirin girtin, hejmarek zêde ya rojnamevanan di girtîgehan de têne cezakirin. Lê tevî wê rewşa zor û zehmet jî îro bi hezaran xebatên çapemeniya azad di şert û mercên herî dijwar de li dijî hemû siyasetên inkar û tunekirinê li ber xwe didin û xebatên xwe didomînin. Li Rojhilatê Kurdistan jî, tevî hemû şert û mercên dijwar jî çalakvan û xebatkarên çapemeniyê yên di şert û mercên herî dijwar de kar dikin, karîbûn dengê Serhildanên Jin jiyan azadî bi hemû raya giştî ya cîhanê re parve bikin. Li Başûrê Kurdistanê jî kar û xebatên ragihandina azad jî li wir bengehekî xwe yê mezin saz kiriye. Li Rojava jî di dema şoreşê de zemînek mezin ji xebatên ragihandinê li herêmê hate avakirin. Ev zemîn di encama tekoşîneke mezin a xelkên herêmê de pêk hat.”



Dilyar da zanîn ku heger niha di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de nêzî zêdeyî 125 sazî û dezgehên ragihandinê yên herêmê û navdewletî dixebitin û di van saziyan de nêzî hezar û 700 kes dixebitin, ev ne ji valatiyê hatiye, lê ew encama tekoşîna û fedekariya bi dehan şehîdên ragihandinê ye. Hevserokê Yekîtiya Ragehandina Azad Dilyar Cizîrî da xuyakirin ku Ragihandina Azad di piratîka şoreşê de ji bê derfetî destpê kir û gavên herî mezin hatin avêtin û axaftina xwe wiha qedand: “Ji bo ragihandina azad karibe di demên pêş de jî erka xwe pêk bîne, pêwîstî bi pêşxistina pîşeyî ya ragihandinê heye. Ew jî bi sûdwergirtina ji ezmûna salên derbasbûyî û vekirina zemînên pêşxistinê. Niha di zanîngehên herêmê de beşên ragihandinê hatine vekirin û bi dehan xwendekar di wir de têne perwedekirin. Di heman demê de sazî û dezgehên hatine vekirin, cihehî guncaw ê perwedekirin û afirandinê ye. Ev derfet berê tune bû. Ê me piratîka karê ji me re bû hêmanê bingehîn ê perwedeyê. Niha zemîn ava bûye û bingeha wê hatiye danîn.”



Di haman çarçoveyê de Edîtora Giştî ya Beşê Erebî ya Rojnameya me Ronahî derbarê Rola jinê di rojnamegeriyê de wiha got: “Wekî tevahiya aliyên din yên jiyanê, xebatên ragihandinê li ser Kurdan li Kurdistanê qedex bû, ji xwe bêşê ku herî zêde tundî li ser dihat meşandin jî, jin bû, ev yek jî hişt ku jin ji xebatên ragihandinê dûr bike ve Lê piştî Şoerşa Rojava pêvajoyeke nû ji jinan re dest pê kir. Ragihandina jin di Kurdistanê de karektêra jin di ragihandinê de guhert, him ji aliyê weşan û zimanê jin ve û him jî ji aliyê rola jin di civakê de bi taybet pîştî avakirina navenda ragihandina jin piştre avakirina yektiya ragihandina jin. Jin di vî derbarî de roleke mezin lîst, herwiha di çareserkirina pirsgirêkên jinan û parastina wan ji tundiyê û derxistina rastiya Şoreşa Rojava, rola ragehandina jin serekebû.”



### ’Divê nifşên nû di xizmeta civak û doza gelê kurd de bin’

Derbarê Heman mijarê de edîtorê Ajansa HAWAR’ê Ehmed Hîmo ji me re axivî diyar kir ku piştî lidarketina Şoreşa 19’ê Tîrmehê ji bo danasîna vê şoreşê kar û xebatekî pir mezin hat kirin, li Rojavayê Kurdistanê yekem car Rojnameya Ronahî , yekem radiyo Dengê Cûdî hatin vekirin û wiha domand: “Li gêleka wê hêdî hêdî ji bo ku rastiya şoreşê û civakê li tevahiya cîhanê bê belavkirin, Ajans jî hatin vekirin , yek ji wan jî Ajansa Hawar e ku roleke wê ya ber bi çav heye. Nifşekî pir mezin ji ciwanên kurdan kar û xebatên ragehandinê li Kurdistan û cîhanê didin meşandin. Divê ev nifş di xizmeta civak û doza gelê Kurd de bin , xwe berpirsyarê pêşketina ragehandina kurdî bibînin. Di baweriya min de pêşeroja ragehandina kurdî wê geştir û xurtir bibe.”

### NIHA DEM HATIYE KU LI DIJÎ TİRKIYÊ ÇALAKTIR BIN

**Zekî BEDRAN**



Tirkiye dê yek ji hilbijartinên herî xeternak ên di dîroka komarê de pêk bîne. Dê encamên hilbijartinê hem Tirkiyê, hem jî welatên cîran bandor bike. Her ku çû Erdogan pergala yekzilamiyê ava kir. Welat xist nava pencên faşîzmê. Eger vê hilbijartinê qezenç bike dê faşîzm bi giştî bibe serwer. Ev tê wê wateyê ku dê dagirkerî û êrîş li axa Sûriye û Iraqê jî bidome. Ji ber ku kampaniya hilbijartinê li ser dijminahiya Kurd û milîtarîzmê dimeşîne.

Erdogan di çêbûna şerê navxweyî yê Sûriyê, kuştina bi hezaran kest û hilweşîna welat de rolek sereke lîst. Niha jî dibêje rêveberiya Şamê were em hevdîtinan çêbikin. Lê qet qala dawîlêanîna dagirkeriyê nake. Di rojên beriya niha de Wezîrê Karê Derve Mevlût Çavûşoglu got “Em mercê vekişîna leşkerên xwe napejirînin”. Piştî wê berdevkê Erdogan Îbrahîm Kalin dîsa bi awayek vekirî diyar kir ku dê ew ê êrîşên leşkerî yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê bidomînin. Di hevdîtinên bi Sûriyê re diyar kir ku hêviya wan “Parastina sînor û ewlehiya Tirkiyê ye, xilaskirina terorê û vegerandina penaberên Sûriyê ye”.

Eger Tirkiyê sînorên xwe biparêz e, pêwîstî bi dagirkirina Sûriyê tune ye. Dê artêşa xwe bikşîne hindirê sînorê xwe, bi dilê xwe welat û sînorê xwe biparêz e. Ji bo vê pêwîstî pê tune ku axa Sûriyê dagir bike, nîjadan tune bike, artêş û hikumetên alternatîf ava bike û belavî derdorê xwe bike. Kurd û vebijarka demokratîk a li Sûriyê ji holê rakirin, rêveberiya xweser ji holê rakirin çawa dibe têkoşîna li dijî terorê? Ev pratîk bi xwe tê wateya belavkirina terorê li cîranan. Hem jî, El- Nûsra û çeteyên li dora wê ku tevahî cîhan weke terorê bi nav dike ji aliyê Tirkiyê ve tê parastin, Tirkiye wan diparêz e. Li herêmên dagirkirî, DAIŞ jî di nav de her çeteyên ku kapê xwe qetandî cirîd diavêjin. Tirkiyê ji van çeteyan re sîwana parastinê ava dike. Wan perwerde dike û piştgiriya aborî dide.

Îro li Sûriyê hêza herî êrîşkar û xwînê dirjîne Tirkiyê bi xwe ye. Bi SÎHA’yan û sîwqastan qetilkirina mirovan bûye karê wan ê rojane, bênavber gund tên bombebarankirin. Alozî û kaosê ava dike, îstiqrarê xirab dike û dixwaze bi vî awayî herêmê vale bike. Çete şandine ser serê gel, talan û wêrankarî bûye şêweyê jiyana wan. Ew bi xwe van tiştan dike û qaşo li Sûriyê li dijî terorê disekine! Kes Tirkiyê li Sûriyê naxwaze, kesê ew venexwendiye. Ji bo herêmên dagirkirî bixe nava sînorên xwe amedekariyan didomînin. Çawa ku Hatay ji Sûriyê qut kirin û tevlî axa Tirkiyê kirin, niha heman tiştî li Efrîn û herêmên din ên dagirkirî jî dike. Eger hikumeta Sûriyê jî weke Qibrisê dema axa wê di bin dagirkeriyê de be li ser masê rûnê, derxistina Tirkiyê dê ne gengaz be. Madem hewl dide têkiliyên xwe bi dewletên Ereb re sererast bike, wê demê pêwîste piştgiriya wan jî bigre û zextê bike ku Tirkiyê ji axa xwe derxe. Erdogan ketiye tengasiyê. 21 sale welat bi rê ve dibe. Ne di şer de bi ser ket, ne jî li Sûriyê gihişt armancên xwe. Armanca wî ew bû, bi destê Îxwanî û hêzên din rêveberiya Beşar Esad hilweşîne û wan çeteyan bîne ser desthilatê. Heman demê de Kurdan di qirkirinê re derbas bike û ji holê rabike. Di van herdû armancên xwe de jî bi ser neket. Ji derveyî vê, niha penaberên Sûriyê li Tirkiyê di armanca herkesî de ne. Erdogan ew weke hêza kar a erzan bikar anîn. Li dijî Ewropayê veguherand çekek ê û li ser pişta wan bi milyaran Euro stand. Di heman demê de ji bo çeteyên di destê xwe de leşker ji nava penaberan derxist. Li gel vê jî niha penaber li lingê wan aliyane.

Sedema evqas israra ji bo hevdîtina bi Esad re, ne aştiya li Sûriyê û pêçana birîna gel e. Dixwaze bi Esad re lihev bike, dest bi pêvajoyek nû ya xwînrij bike û xwe ji penaberan xilas bike. Di bernameya hevdîtinên wan de ji Sûriyê re tiştek xêr nîne. Ew bi xwe jî tînin ziman. Dê ewlehî û sînorên xwe biparêz in, ji penaberan xilas bibin û bi hev re Kurdan biqelînin. Armanc û niyeta wan evqas zelal e. Gelên Sûriyê neçarin li hember dagirkerî û êrîşkariyê hişyar bin. Ji sala 2011’an ve berdêlek giran hat dayîn. Hîn jî çareseriyek ku xwe dispêre aştî û demokrasiyê li holê tune ye. Di vî alî de pêwîste gelên Sûriyê bi daxwazên demokratîk vîna xwe danin holê. Divê bibin yek, birêxistin bibin û ji bo qewtandina dagirkeran dengê xwe bilind bikin.